## Neuruppin

**Klînîka Zanîngehê ya Ruppin-Brandenburg**
Fehrbelliner Straße 38
16816 Neuruppin
Telefon: 03391 39 45 15

## Oranienburg

**Klînîka Oberhavel'ê**
Robert-Koch-Straße 2-12
16515 Oranienburg
Telefon: 03301 66 30 17

## Perleberg

**Nexweşxaneya Navçeyî ya Prignitz'ê**
Dobberziner Straße 112
19348 Perleberg
Telefon: 03876 30 30

## Potsdam

**Nexweşxaneya Alexianer St. Josefs'ê li Potsdamê**
Zimmerstraße 6
14471 Potsdam
Telefon: 0331 96 82 11 12

**Klînîka Ernst von Bergmann Potsdamê**
Charlottenstraße 72
14467 Potsdam
Telefon: 0331 24 15 50 51

## Rüdersdorf

**Immanuel Klinik Rüdersdorf**
Seebad 82/83
15562 Rüdersdorf li nêzîkî Berlînê
Telefon: 033638 833 55

## Schwedt/Oder

**Asklepios Klinikum Uckermark**
Li Klînîka 1
16303 Schwedt/Oder
Telefon: 03332 53 41 90

# Alîkariya lezgîn a bijîşkî û dabînkirina şopandina nihênî piştî destdirêjiya zayendî

Piştgirîbûyî ji aliyê me ve:

LAND BRANDENBURG
Ministerium für Gesundheit und Soziales


**Enstîtûya Eyaletî ya Brandenburg'ê ji bo bijîşkiya qanûnî**
Navenda Hevahengiyê

Lindstedter Chaussee 6
14469 Potsdam
Telefon: 0331 5685 0
Email: vss@blr.brandenburg.de



Rûpelsazî û çapkirin: Ajansa Reklamê ya MAPO'yê
Version: 50 Exemplare, März 2025

Sprache: Kurdisch


LAND BRANDENBURG

# SOS

## PIŞTÎ DESTDIRÊJIYA ZAYENDÎ

## Klînîkên Hevkar ên xwarê alîkariyê didin

## Bad Saarow

**Klînîka Helios'ê Bad Saarow**
Pieskower Straße 33
15526 Bad Saarow
Telefon: 033631 711 11

## Brandenburg an der Havel

**Klînîka zanîngehê ya Brandenburg an der Havel'ê**
Hochstraße 29
14770 Brandenburg an der Havel
Telefon: 03381 41 29 00

## Cottbus

**Zanîngeha Bijîşkî ya Lausitz – Carl Thiem'ê**
Thiemstraße 111
03048 Cottbus
Telefon: 0355 46 24 68

## Eberswalde

**Klînîka GLG Werner Forßmann Eberswalde'ê**
Rudolf-Breitscheid-Straße 100
16225 Eberswalde
Telefon: 03334 690

## Frankfurt/Oder

**Klinikum Frankfurt (Oder)**
Müllroser Chaussee 7
15236 Frankfurt/Oder
Telefon: 0335 548 27 10 di saetên xebatê de
Telefon: 0335 548 13 01 derveyî saetên xebatê

SOS
NACH VERGEWALTIGUNG

Heke tu rastî şideta zayendî hatiye, dibe ku ji ber tirs, şerm an bêhêvîtî, derdem piştî bûyerê amadeyî têkiliya bi Polîs re nebî. Lê bêyî berçavgirtina vêya ku dixwazî raporekê bişînî yan na, hwceyî çavdêriya bijîşkî yî – heta heke di destpêkê de hîç ziyaneke dîtbar nebînî.

Demê roleke giring di dabînkirina rêçan de heye. Pirraniya şopandinan tenê **dikarin di 72 saetên destpêkê** piştî bûyerê werin bidestxistin. Loma ji kerema xwe **di dema herî lez de bi dû terapiya bijîşkî be**. Ji bo vî karî, ji kerema xwe digel beşeke lezgîn a navendî ya klînîkên hevkar pêwendî çê bike.

**Çiqasî zûtir, baştir** – nemaze heke gumana te li ser madeyên hişber ên jêbirî hebe, lezgîniyeke zêde heye, ji ber ku girêdayî bi madeyê tenê di çend saetên kêm de dikarin bên naskirin. Di dema lênihêrînê de, xetereya nexweşiyên vegir û dugiyanîbûna gengaz jî tên behskirin.

Destdirêjiyeke zayendî,
**babeteke lezgîn a bijîşkî ye!**

Li klînîkên hevpar, tu yê çavdêriyeke gelekî pêbawer wergirî.

## Ji bo te çend rêgeh vekirî ne

### 1. Ragihandina lezgîn bo Polîs

Tevî hebûna nîgeraniyên gengaz, em biher awayî dixwazin te han bidin ku rapora polîsî raber bikî. Tenê di vê rewşê de şopandina sizayî pêkan e. Heke dixwazî bilez raporê bişînî, digel Polîs (Telefona 110) têkilî dayîne. Ev yek dibe sebeb ku bilez lêkolîn dest pê bikin û hemî kiryarên pêwîst pêk bên.

### 2. Alîkariya lezgîn a bijîşkî û dabînkirina şopandina nihênî

Heke tu piştrast nînî ku dixwazî derdem piştî bûyerê raporekê bişînî yan na, diakrî bêyî polîs, daxwaza alîkariyê bikî. Ji bo vî karî, ji kerema xwe herî zû digel klînîkeke hevkar a destnîşankirî têkilî dayîne. Li wir ji bilî lênihêrîna bijîşkî, heke bê daxwazkirin, dikare şopandina sûcê jî bi awayê nihênî were parastin. Madeyên şopndinê şîfredarkirî dikin û bo heyama 10 salan ewleh tên parastin. Heke te piştra biryara ragihandinê da, polîs dikare bi rezamendiya te şehediyan bi kar bîne. Babetên şopandina hêminkirî yên nihênî dikarin ji aliyê te ve radestî polîs bên kirin û li gor daxwaza te yan (bêyî destwerdana te) piştî derbasbûna heyama hilgirtinê, zûtir werin jinavbirin.

Ku bixwazî dikarî digel navendên rawêjakriyê yên raberkirî ji aliyê **Alîkariya bo qurbanî Lijneya Eyaletê ya Brandenburg e.V.** ku tam nihênî, dilxwazî û nenas, belaş û bi hemî zimanan (bi rêya wergêr) in, têkilî çê bikî.

Belgewarkirina ziyanan û dabînkirina şopandinê bi parastina din ji bo kesên ziyandîtî belaş e.

### 3. Alîkariya bilez a bijîşkî bêyî dabînkirina şopandinê

Heke tu dabînkirina şopandinê naxwazî,divê herî zû lênihêrîna bijîşkî pêk bînî. Ku bixwazî dikarî zanyariyên têkildarî xizmetên rawêjkariyê jî wergirî.

## Têbîniyên giring dabînkirina şopandinê

**Ji kerema xwe beriya dabînkirina şopandinê şûştinê pêk neyîne,** heta heke ji bo te dijwar be. Di vê rewşê de dibe ku bandorên giring ji nav biçin.

Ev pêşniyar ji bo **wan kesan e ku tûşî şideta zayendî bûne**, bêyî berçavgirtina zayend, jêder, ol, pênaseya zayendî yan têkiliya civakî ya kesî.

Lêkolîn nihênî **ne, bi vê wateyê ku serbixwe ji raporê ne**, lê nenas nîne. Hûrgiliyên kesê/a ziyandîtî li klînîkê tên tomarkirin. Ev yek ji bo destebendiyê di rapora din de giring e. Bi vê yekê heta wê demê nihênîbûna bijîşkî tê sepandin û zanyarî ji aliyê klînîkê ve ji bo aliyên sêyem tên şîfredarkirin.

Kincên lixwerkirî yan alavên din ji bo şopandinêwek mînak qumaşeke text bi xwe re bîne klînîkê. Alavên şopandinê yên şil di rewşa mumkin de divê li nav telîsên kaxezî bên hilgirtin da ku li wir ziha bibin.

Ji bo çavdêriya seretayî, lênihêrîneke fîzîkî tevî belgewarkirina nivîskî û wênekişandinên din ji şehediyan pêk tê. Ziyanên ku hewceyî terapiyêne tên dermankirin û têderxistinên zêdetir bi awayê babetî pêk tê. Tu dikarî kesê/a ku bawerî pê tînî ji bo piştevaniyê (hestbarî) tevî xwe bînî.

Madeyên şopandinê tên dabînkirin da ku bikarin li dadgehê werin bikaranîn. Tiştê ku dimîne biryara te ye ku gelo sûcê ragihînî yan na.

Brandenburgisches Landesinstitut für Rechtsmedizin

Ji bo zanyariyên zêdetir li ser hilgirtina-madeyên şopandinê yên hêminkirî, diakrî bi **Navenda Hevahengiyê ya Enstîtûya Eyaletî ya Brandenburgê ji bo Bijîşkiya Qanûnî (BLR)** pêwendî çê bikî.
E-Mail: vss@blr.brandenburg.de

## Rawêjkarî û Piştevanî

### Hevbeşê hevkariyê

Opferhilfe Land Brandenburg e.V.

**Rawêjkariya Gorî li Navendan**

| | | |
|---|---|---|
| **Cottbus** | Telefon. | 0355 72 96 052 |
| **Frankfurt O.** | Telefon. | 0335 66 59 267 |
| **Neuruppin** | Telefon. | 03391 51 23 00 |
| **Potsdam** | Telefon. | 0331 28 02 725 |
| **Senftenberg** | Telefon. | 03573 14 03 34 |

**Tu dikarî venihêrîneke giştî li ser klînîkên seretayî yên Trawmayê Li Brandenburg'ê Li vir bibînî.**

### Telefonên alîkar

Hilfetelefon Gewalt gegen Frauen 116 016 www.hilfetelefon.de

0800 1239900 HILFETELEFON GEWALT AN MÄNNERN

Hilfetelefon Schwangere in Not 0800 40 40 020

**Tu dikarî zanyariyên herî birojkirî li ser pêşniyara nihênî ya dabînkirina şopandinê li vir bibînî.**